Hesen Huseyîn Denîz

# FÊRBÛNA KURDÎ

## PÊNGAVA YEKEM




AZAD

fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 1 16.05.19 05:40

# FÊRBÛNA KURDÎ

PÊNGAVA YEKEM
(Çapa 2013an: Weşanxaneya Berfîn-Almanya)

**Amadekar - Nivîskar:**
Hesen Huseyîn Denîz

**Perwerde**: 01 / 13

**Gerînendeya Weşanê:**
Eslîxan Yildirim

**Sererastkirin:**
Eslîxan Yildirim

**Berg û Rûpelsazî:**
Hesen Huseyîn Denîz
(www.zimanekurdi.ch)

**Çapa Yekem:**
Weşanên Azad, 2019

**Wênexêzî**:
Elif Balci û ji ser tevna înternetê

**Çapxane:**
İmaj Matbaacılık Reklam ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
Maltepe Mah. Litros Yolu Sk. No:2-4
2. Matbaacılar Sitesi 4NB15
Topkapı - İstanbul
Sertifika No:26954

**ISBN**: 978-605-81463-2-7
Sertîfîka No: 40407

**Navnîşan:**
AZAD YAYINEVİ
Viranşehir Mah.
34330. Sk. No: 15 A/4
**Mezitli / Mersin**

**Web**: www.wesanxaneyaazad.net
**E-mail**: agahi@wesanxaneyaazad.net

© Mafê wê parastî ye.
© Ji bilî danasînê bêyî destûr bi tu awayî nayê kopîkirin û nayê belavkirin.

# FÊRBÛNA KURDÎ

## PÊNGAVA YEKEM

AZAD

fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 3 16.05.19 05:40

*Hesen Huseyîn Denîz*
*Li Stilîla Nisêbînê jidayik bûye. Xwendegehên xwe li Serêkaniya Rihayê, li Stenbol û li Nîgdeyê qedandiye. Ji ber xebatên şoreşgerî di dema cûntaya leşkerî ya salên heyştêyî de li zindana Amedê maye, piştî hatiye berdan têkoşîna xwe bi awayên cuda domandiye.*
*Piştî salên du hezarî li Başûrê Kurdistanê û li wargeha penaberên Kurd demekê dersên Kurdî dide, şûnre derbasî Swîsre dibe. Ji wê demê ve li Swîsre mamosteyiya zimanê Kurdî dike û bi xebatên xwe hîndekariya Kurdî li vî welatî daye fermîkirin.*
*Derveyî mamosteyiyê ew karê wergerê û nivîskariyê dike.*
*Ew endamê PENa Kurd û endamê saziya nivîskarên Swîsre ye.*

**Pirtûkên Hesen Huseyîn Denîz ên heta niha hatine çapkirin:**

1-Hêvî Her Dem Heye I - Roman
2-Hêvî Her Dem Heye II - Roman
3-Rênîşanêra Vegotina Kurdî – Rêziman û kompozîsyon
4-Canê Hez Dike - Çîroka ji bo zarokan
5-Ro û Zê – Ji çîrokên gelêrî
6-Mirovê Bê Derd – Ji çîrokên gelêrî
7-Serpêhatiyên Penabertiyê-Serboriya penaberên Wargeha Mexmûr
8-Can Huseyîn – Biyografiya şehîd Huseyîn Denîz - bi Tirkî
9-Huseyîncan – Biyografiya şehîd Huseyîn Denîz - bi Kurdî
10- Ji çîrok û çîvanokên Kurdan- Ji çîrokên klasîkî yên Kurdan
11-Pêngava Yekem – Pirtûka hînbûna Kurdî
12-Fêrbûna Hêsan – Pirtûka hînbûna nivîsa Kurdî
13- Pêkenokên Kurdî
14- Dilo û Canê - Çîvanok

*Web: https://wesanxaneyaazad.net*

*E-Mail: agahi@wesanxaneyaazad.net*

fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 4 16.05.19 05:40

**Ez vê pirtûkê diyarî giyana mamosteyên nemir Mûsa Anter û Huseyîn Denîz dikim.**

*Mamoste û xwendekarên hêja û delal,*

*ev pirtûka di destê we de, ji bo fêrbûna zimanê Kurdî - Kurmancî hatiye amadekirin. Kesên nû dest bi naskirina tîp, peyv û hevokan dikin û nivîsandin û xwendinê nû fêr dibin dikarin li ser vê pirtûkê, alfabeya Kurdî û mijarên bingehîn ên jiyana rojane hîn bibin.*

*Di her rûpelê de tiştê hatiye nivîsîn divê bi deng were xwendin û li ciyê vala yê binê rûpelê ji nû ve were nivîsîn ku hînbûna dev û guh û dest û çav bi hev re çêbibe.*

*Di ravekirina peyv û hevokan de, divê mamoste bi mînakdayîn wateya peyv û hevokan bi xwendekaran bide têgihiştin.*

*Her wiha ji bo kesên dixwazin bê mamoste fêr bibin jî, di pirtûkê de gelek wêne hatine bicîkirin û ji bo her tîp an peyva tê fêrkirin li hemberê wêneyê wê heye. Dema mirov li wêneyî dinêre, dizane bê mijar li ser çi ye û bi vê sedemê pirtûk hêsantir dibe.*

*Serkevtin be!*

fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 5 16.05.19 05:40

fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 6 16.05.19 05:40

# NAVEROK

1. ALFABEYA KURDÎ – KURMANCÎ ........ 12
2. MALBAT ........ 46
3. CÎNAVKÊN KESANE ........ 49
4. CÎNAVKÊN XWEDÎTIYÊ ........ 57
5. ALAVÊN Lİ XWENDEGEHÊ Û LI MALÊ ........ 65
6. CÎNAVKÊN ŞANÎDANÊ ........ 70
7. AJAL ........ 79
8. HIJMAR ........ 82
9. ŞÎNAYÎ Û FÊKÎ ........ 100
10. RENG ........ 103
11. XWARIN Û VEXWARIN ........ 111
12. DEM Û MEH ........ 117
13. LÎSTIK ........ 154
14. ÇÎROK Û ÇÎVANOK ........ 158
15. STRAN ........ 181
16. WÊNEXÊZÎ, BOYAXKIRIN Û JÊKIRIN ........ 189
17. XWENDIN ........ 197
18. SERSAL, NEWROZ, BÛKA BARANÊ, ZÛGOTINK Û METELOK ........ 210
19. ÇANDA KURDAN ........ 217
**PÊVEK** ........ 231

fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 8 16.05.19 05:40

## Ji bo mamosteyên li ser vê pirtûkê dersan bidin
## BERNAMEYA FÊRKIRINÊ YA SALEKE XWENDEGEHÊ YA KURDÎ-KURMANCÎ

### 1. Fêrkirina Alfabeya Kurdî

Tîpên alfabeyê di nava peyvan û hevokên hêsan de bidin fêrkirin (hînkirin). Ji bo kesên peyvan nas nakin wêneyan bi kar bînin. Xwendekar bila ji bo xwe kartên biçûk ên fêrbûnê çêbikin. Li aliyekî kartê peyvê bi Kurdî, li aliyê din an bi zimanekî din binivîsin an bi wêneyê peyvê diyar bikin.

### 2. Fêrkirina axaftin û xwevegotinê:

a) Axaftina li ser endamên malbatê .
b) Danasîna xizmên nêz ên malbatê.
c) Bikaranîna cînavkên kesane.
ç) Bikaranîna cînavkên xwedîtiyê.
d) Bikaranîna cînavkên şanîdanê.
e) Nasîna alavên li xwendegehê û li malê.
(Alavên li xwendegehê û li malê bi riya wêneyan bidin nasîn. Ji bo wê lîstika dawî ya di pêveka yekê de bi kar bînin. Wêneyan şanî wan bidin û ew bila navê wan bibêjin. Wêneyan bidin wan û bila ew li binê wan navê wan binivîsin.)



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 9 16.05.19 05:40

ê) Ajalên zêde tên nasîn bidin hînkirin. (Ji bo wê lîstika dawî ya di pêveka duyê de bi kar bînin. Wêneyan şanî wan bidin û ew bila navê wan bibêjin. Wêneyan bidin wan û bila ew li binê wan navê wan binivîsin.)

## 3. Fêrkirina pêdiviyên jiyana rojane:

a) Fêrbûna hijmaran (Destpêkê ji yekê heta dehan û piştre ji dehan heta bîstî bidin fêrkirin.)
b) Şînayî û fêkî (Ji bo wê lîstika dawî ya di pêveka sêyê de bi kar bînin. Wêneyan şanî wan bidin û ew bila navê wan bibêjin. Wêneyan bidin wan û bila ew li binê wan navê wan binivîsin.)
c) Rengên bingehîn û yên têperînê bidin nasîn (Ji bo vê di pêveka çarê de strana rengan bidin fêrkirin.)
ç) Xwarin û vexwarinên Kurdî li gor danên rojê bidin hînkirin.
d) Demên rojê, meh, sal û demsalan û bikaranîna demjimêrê li ser wêneyên saetan bidin fêrkirin.

## 4. Destpêkirina xwendin û nivîsandinê:

a) Xwendekar bila bixwînin û binivîsin. (Xalên li jêr dikarin alîkariyê bidin we.)
b) Xwendina çîrokên:
- Şêr, Piling û Rovî
- Gur û Heft Karik
- Ker û Hêştir
- Kew û Rovî
- Şahmaran


fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 10 16.05.19 05:40

## 5. Mûzîk

Stranên hêsan bi alîkariya amûrên mûzîkê bidin fêrkirin:

- Zimanê Kurdî
- Malan Bar Kir
- Ha Gidî Mişko
- Şemamê
- Sirûda Netewî Ey Reqîb
- Newroz

## 6. Lîstik

Lîstikên Kurdî

- Kerka Kera Ço.
- Çavgirtînk (Dikarin ji Zarok Tv bidin temaşekirin.)
- Destmalka Min Li Paş Kê.

## 7. Wêne

a) Bi riya wêneyan hînkirina navê tiştan.
b) Bi riya wêneyan lîstina lîstika bi bîr bîne.
(Di pêvekê de.)

Serkevtin ji mamoste û xwendekaran re.
Hesen Huseyîn Denîz

www.zimanekurdi.ch



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 11 16.05.19 05:40




## 1.ALFABEYA KURDÎ-KURMANCÎ NAS BIKIN

Alfabeya Kurdî nas bikin.
Tîpan yek bi yek bixwînin.
Peyvan bixwînin û wan
li ciyên vala binivîsin.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 12 16.05.19 05:40

# A a



av

ax

agir

adar

Azad avê vedixwe.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 13 16.05.19 05:40

# B b



bizin

ba

bar

baran

Bizin giya dixwe.

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 14 16.05.19 05:40

# C c

cawbir

caw

cil

cûm



Cawbir kaxezê dibire.

Ji cawbir re meqes jî tê gotin.

............................................................................................

............................................................................................

............................................................................................

............................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 15 16.05.19 05:40

Ç ç



çav

çay

çar

çente

Mirov bi çavên xwe dibîne.

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

# D d



dest

dev

diran

daristan

Destê min biçûk e.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 17 16.05.19 05:40

# E e



ewr

ez

em

elok

Ewr li ezmên çêdibin.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 18 16.05.19 05:40

Ê ê

êzing

êş

êvar

êm



Êzing darên hişk in.

................................................................................

................................................................................

................................................................................

................................................................................

................................................................................

F f



firoke

fîstan

find

fêrgeh

Firoke difire.

.............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................

G g



gulberoj

gul

guh

gir

Gulberoj zer e.

................................................................................

................................................................................

................................................................................

................................................................................

................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 21 16.05.19 05:40

# H h



hêlîn
heval
hesin
hinar

Hêk di hêlînê de ne.

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 22 16.05.19 05:40

# I i



i tîpek e.

i tîpeke dengdêr e.

i ya biçûk bi xal e.

Ev i ya biçûk e.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 23 16.05.19 05:40

Î î



îsot

îşev

îcar

în

Ev îsota sor tûj e.

.................................................................................................

.................................................................................................

.................................................................................................

.................................................................................................

.................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 24 16.05.19 05:40

J j



jin

jor

jêr

jîn

Jin jîn e.

..................................................................................

..................................................................................

..................................................................................

..................................................................................

..................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 25 16.05.19 05:40

K k



keroşk

ker

kew

kevok

Ev keroşk spî ye.

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 26 16.05.19 05:40

L l

lênûsk

lempe

ling

lêv



Lênûska min heye.

Ji lênûskê re defter jî tê gotin.

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 27 16.05.19 05:40

# M m



masî

mal

mişk

mar

Masî di nav avê de ye.

............................................................................................

............................................................................................

............................................................................................

............................................................................................

............................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 28 16.05.19 05:40

N n

neft

nan

nivîn

nav



Neft li Kerkûkê ye.

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 29 16.05.19 05:40

# O o



Ode

O tîpek e.

Ev o ye.

O girover e.

O tîpeke dengdêr e.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 30 16.05.19 05:40

P p



pênûs

pênc

pel

perperîk

Ev pênûs rengîn in.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 31 16.05.19 05:40

Q q



qaz

quling

qaşûl

qijak

Çêlîk bi qazê re ne.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

# R r



rê

rûn

roj

rû

Rê diçe gundê me.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 33 16.05.19 05:40

S s



sivorî
sêv
selik
sîng

Sivorî berûyê dixwe.

......................................................................................

......................................................................................

......................................................................................

......................................................................................

......................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 34 16.05.19 05:40

# Ş ş



şûşe

şeş

şekir

şîr

Ev şûşe bi devik in.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 35 16.05.19 05:40

# T t



teyr

tor

text

teht

Teyr li ezmên difirin.

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 36 16.05.19 05:40

# U u




Ev tîpa u ye.
Ev u ya biçûk e.
Di nav peyva Kurd de u heye.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 37 16.05.19 05:40

Û û

û

Ez û tu

Ev tîpa û ye.

Û tîpeke gihanek e.

Ev û ya biçûk e.

Kum ^ li serê û heye.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 38 16.05.19 05:40

V v



vekirî

vizik

veger

vala

Te derî vekir.

..............................................................................................

..............................................................................................

..............................................................................................

..............................................................................................

..............................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 39 16.05.19 05:40

W w



werdek

Wan

welat

war

Werdek dimeşin.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 40 16.05.19 05:40

# X x



xox

xal

xwişk

xwarin

Xox fêkiyek e.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



Y y

yek

yar

yazdeh

Yezdan

Yek û yek dike dudu.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 42 16.05.19 05:40

# Z z



zebeş

zer

zîv

zêr

Zebeşo dendikreşo.

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

# Ez tîpên Kurdî hîn bûm:

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| A | B | C | Ç | D | E | Ê | F |
| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
| G | H | I | Î | J | K | L | M |
| 9 | 10 | 11 | 12 | 13 | 14 | 15 | 16 |
| N | O | P | Q | R | S | Ş | T |
| 17 | 18 | 19 | 20 | 21 | 22 | 23 | 24 |
| U | Û | V | W | X | Y | Z | |
| 25 | 26 | 27 | 28 | 29 | 30 | 31 | |

Tu bi xwe tîpên Kurdî û hijmarên li binê wan binivîse:

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 44 16.05.19 05:40

# Tîpên Kurdî yên biçûk wiha ne:

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| a | b | c | ç | d | e | ê | f |
| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
| g | h | i | î | j | k | l | m |
| 9 | 10 | 11 | 12 | 13 | 14 | 15 | 16 |
| n | o | p | q | r | s | ş | t |
| 17 | 18 | 19 | 20 | 21 | 22 | 23 | 24 |
| u | û | v | w | x | y | z | |
| 25 | 26 | 27 | 28 | 29 | 30 | 31 | |

Tu bi xwe tîpên Kurdî û hijmarên li binê wan binivîse:

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |
| | | | | | | | |



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 45 16.05.19 05:40




## 2. MALBATA XWE BIDIN NASÎN

Endamên malbatê nas bikin.

Li gorî xwe li ciyên vala yên hevokan binivîsin.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 46 16.05.19 05:40

Di ser nivîsan re bi pênûsa xwe biçe:

| |
|---|
| Navê min ............................................................ e. |
| Navê birayê min .......................................... e. |
| Navê xwişka min .......................................... e. |
| Navê dayika min .......................................... e. |
| Navê bavê min ................................................ e. |
| Navê bapîrê min .......................................... e. |
| Navê dapîra min .......................................... e. |
| Navê xaltiya min .......................................... e. |
| Navê xalê min ................................................ e. |
| Navê mamê min .......................................... e. |
| Navê meta min .......................................... e. |
| Navê pismamê min ................................. e. |
| Navê dotmama min ................................. e. |
| |
| Ez ............................................................ salî me. |
| Birayê min .......................................... salî ye. |
| Xwişka min .......................................... salî ye. |
| Bavê min ................................................ salî ye. |
| Dayika min .......................................... salî ye. |
| Bapîrê min .......................................... salî ye. |
| Dapîra min .......................................... salî ye. |



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 47 16.05.19 05:40

# Em hijmaran ji yek heta dehê hîn bibin:

| | | |
|---|---|---|
| 1 | yek | |
| 2 | du | |
| 3 | sê | |
| 4 | çar | |
| 5 | pênc | |
| 6 | şeş | |
| 7 | heft | |
| 8 | heyşt | |
| 9 | neh | |
| 10 | deh | |








fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 48 16.05.19 05:40



Ez Tu Ew Ew



Em Hûn Ew

## 3. CÎNAVKÊN KESANE

### Cînavkan nas bikin.

Cînavkên kesane û cînavkên xwedîtiyê bixwînin û li ciyên vala binivîsin.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 49 16.05.19 05:40

# EZ



Ez Rewşen im.

Navê min Rewşen e.

Ez keç im.

Ez xwendekar im.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 50 16.05.19 05:40

# TU



Tu Rewşen î.
Navê te Rewşen e.
Tu keç î.
Ez Rodî me.

.............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 51 16.05.19 05:40

# EW



Ew Rûken e.
Ew hevala min e.
Ez û Rûken, em diçin xwendegeha Kurdî.

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 52 16.05.19 05:40

# EM



Em zarok in.
Em gelek in.
Em keç û kur in.
Em hevalên hev in.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 53 16.05.19 05:40

# HÛN




Hûn jî zarok in.
Hûn keç û kur in.
Hûn pênc zarok in.
Hûn xwendekar in.

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 54 16.05.19 05:40

# EW



Ew xwendekar in.
Ew jî zarok in.
Ew şeş zarok in.
Ew hemû keç in.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 55 16.05.19 05:40

# Kî dixwîne?



Ez dixwînim.

Tu dixwînî.

Ew dixwîne.

Em dixwînin.

Hûn dixwînin.

Ew dixwînin.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 56 16.05.19 05:40




a

| |
|---|
| min |
| te |
| wê (mê) |
| wî (nêr) |
| |
| me |
| we |
| wan |

## 4. CÎNAVKÊN XWEDÎTIYÊ

Cînavkên xwedîtiyê di dema borî de bi lêkerên gerguhêz re wek cînavkên kesane tên bikaranîn:

| | |
|---|---|
| Ez sêvekê dixwim. | Dema niha |
| Min sêvek xwar. | Dema borî |



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 57 16.05.19 05:40

# MIN



Min tacek çêkir.
Ew taceke zer e.
Min tac ji kulîlkan çêkir.

.............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................

# TE



Te tacek çêkir.
Ew jî taceke zer e.
Kulîlkên te jî zer in.
Tac li ser serê te ye.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 59 16.05.19 05:40

# WÊ



Wê tacek çêkir.
Taceke wê heye.
Taca wê jî zer e.
Wê tac neda wî.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 60 16.05.19 05:40

# Wî



Wî tacek çênekir.
Taca wî tine ye.
Wî berfemêrek çêkir.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 61 16.05.19 05:40

# ME



Me tac çêkir.
Me du tac çêkir.
Tacên me jî zer in.
Me kulîlk berhev kirin.

....................................................................................

....................................................................................

....................................................................................

....................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 62 16.05.19 05:40

# WE



We tac çênekir.
Tacên we tine ne.
We çima tac çênekir?
We berfemêr çêkir.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 63 16.05.19 05:40

# WAN



Wan jî tac çênekir.
Wan tacek çênekir.
Wan berfemêr çêkir.
Ew bê tac in.

..........................................................................

..........................................................................

..........................................................................

..........................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 64 16.05.19 05:40




## 5. ALAVÊN LI XWENDEGEHÊ Û LI MALÊ

Navê alavên xwendegehê yên hûn nas dikin ji hev re bibêjin.

Hûn dikarin lîstika "Bi bîr bîne" bilîzin:
*Lîstik li dawiya pirtûkê di pêveka 1ê de ye. Wêneyan jêbikin, berûvajî deynin ser maseyê. Bi dorê du wêneyan rakin. Ger ji hev bin ji bo xwe bibin, ger ne ji hev bin dor derbasî lîstikvanê din dibe.*



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 65 16.05.19 05:40

Derî



Pace



Mase



Kursî



Depê nivîsê





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 66 16.05.19 05:40

Çente



Kaxez



Pênûs / qelem



Rastkêş




Kilspî



..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 67 16.05.19 05:40

# Çenteyê xwe veke, tiştên tê de binivîse:




..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 68 16.05.19 05:40

Dolaba kincan veke, tiştên tê de binivîse:




pantor
şal
kum
derpî
kiras
lepik
gore
pêşgîr
fanêle

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................







## 6. CÎNAVKÊN ŞANÎDANÊ

Mirovan şanî bidin û bipirsin:
Ev kî ye?
Tiştan şanî bidin û bipirsin:
Ev çi ye?
Gava mirov ji me dûr be:
Ew kî ye?
Gava tişt ji me dûr be:
Ew çi ye?



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 70 16.05.19 05:40

# EV






Ev sêv e.

Ev sêvek e.

Ez vê sêvê şanî didim.

Ev sêveke sor e.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 71 16.05.19 05:40

# EW






Ew morî ye.

Ew moriyek e.

Ew moriyekî reş e.

Ew morî pir kar dike.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 72 16.05.19 05:40

# VAN






Van sêvan bijmêre.

# WAN






Wan sêvan bijmêre.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 73 16.05.19 05:40

# Vî






Vî çûkî biparêze.
Li vî çûkî binêre.
Ev çûk rengîn e.

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 74 16.05.19 05:40

# Wî






Wî çûkî biparêze.
Li wî çûkî binêre.
Ew çûk rengîn e.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 75 16.05.19 05:40

# VÊ






Vê darê biparêze.

Vê darê av bide.

Ev dareke şîn e.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 76 16.05.19 05:40

# WÊ






Wê darê biparêze.
Wê darê av bide.
Ew dareke şîn e.

....................................................................................................

....................................................................................................

....................................................................................................

....................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 77 16.05.19 05:40

# VAN






Van çûkan bijmêre.

.................................................................................

# WAN






Wan daran av bide.

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 78 16.05.19 05:40



# 7. AJALAN NAS BIKIN

Navê ajalên hûn nas dikin ji hev re bibêjin.

Hûn dikarin lîstika "Bi bîr bîne" bilîzin.

*Lîstik li dawiya pirtûkê di pêveka 2yê de ye. Wêneyan jêbikin, berûvajî deynin ser maseyê. Bi dorê du wêneyan rakin. Ger wêne ji hev bin ji bo xwe bibin, ger wêne ne ji hev bin dor derbasî lîstikvanê din dibe.*



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 79 16.05.19 05:40

## Navê ajalan hîn bibe
## û li ser pela din binivîse:


pisîk


kûçik


çêlek


dîk


mirîşk


elok


berx


mî


bizin


hêştir


qird


qijak



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 80 16.05.19 05:40

## Bi navê ajalên tu dizanî, li jêr hevokan saz bike:

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 81 16.05.19 05:40

| | |
|---|---|
| 1 | yek |
| 2 | du |
| 3 | sê |
| 4 | çar |
| 5 | pênc |
| 6 | şeş |
| 7 | heft |
| 8 | heyşt |
| 9 | neh |
| 10 | deh |

## 8. HIJMARAN NAS BIKIN

Em hijmaran hîn bibin:
Em ji yek heta dehê hîn bûbûn.
Emê niha jî ji 1ê heta 20a hîn bibin.
Emê piştre zêdetir hîn bibin.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 82 16.05.19 05:40

1



Yek

Perperîkek.

Ev perperîkek e.

Ew perperîkek e.

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................

2



## Du/dudu

Du stêrk.

Ew du stêrk in.

Her du stêrk jî dibiriqin.

............................................................................

............................................................................

............................................................................

............................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 84 16.05.19 05:40

3



# Sê/sisê

Sê gul.

Ew sê gul in.

Her sê gul jî sor in.

................................................................................

................................................................................

................................................................................

................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 85 16.05.19 05:40

# 4



## Çar

Çar pêlav.
Ev çar pêlav in.
4 pêlav dikin 2 cot.

..........................................................................

..........................................................................

..........................................................................

..........................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 86 16.05.19 05:40

5



## Pênc

Pênc gog.

Ew pênc gog in.

Her pênc gog jî yên lîstinê ne.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 87 16.05.19 05:40

6



Şeş

Şeş îsot.
Ev şeş îsot in.
Şeş dike sê cot.

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 88 16.05.19 05:40

# 7



## Heft

Heft mêş.
Ew heft mêş in.
Mêş difirin.

.............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 89 16.05.19 05:40

8



# Heyşt

Heyşt garis.
Ev heyşt garis in.
Min heyşt garis kirî.

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................

........................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 90 16.05.19 05:40

9



Neh

Neh çîçik.
Di hijmartinê de piştî heyştan neh tê.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 91 16.05.19 05:40

# 10



# Deh

Di her destekî de pênc tilî hene.
Pênc û pênc dikin deh.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 92 16.05.19 05:40

11




Yazdeh

Saet yazdeh e.

............................................................................................




12

Duwazdeh

Saet duwazdeh e.

............................................................................................

13



Sêzdeh

........................................................................................................

14



Çardeh

........................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 94 16.05.19 05:40

15



Pazdeh

..........................................................................................

16



Şazdeh



..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 95 16.05.19 05:40

# 17



# Hivdeh

........................................................................................................

# 18



# Hijdeh

........................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 96 16.05.19 05:40

19



Nozdeh

................................................................................................

20

Bîst



................................................................................................

30 Sîh

................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 97 16.05.19 05:40

40 Çil / çel

50 Pêncî

60 Şêst

70 Heftê

80 Heyştê



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 98 16.05.19 05:40

90 Nod

........................................

100 Sed

........................................

1 000 Hezar

........................................

1 000 000 Milyon

........................................

1 000 000 000 Milyar

........................................



# 9. ŞÎNAYÎ Û FÊKIYAN NAS BIKIN

Navê şînayî û fêkiyên hûn nas dikin ji hev re bibêjin.

Hûn dikarin lîstika "Bi bîr bîne" bilîzin.

*Lîstik li dawiya pirtûkê di pêveka 3yê de ye. Wêneyan jêbikin, berûvajî deynin ser maseyê. Bi dorê du wêneyan rakin. Ger ji hev bin ji bo xwe bibin, ger ne ji hev bin dor derbasî lîstikvanê din dibe.*



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 100 16.05.19 05:40

## Navê şînayiyan li ser deftera xwe binivîse:

firingî
tomate
bacanê sor





bacanê reş
balîcan

îsot





pîvaz
pîzav

sîr





kulind
rexdik
dolmik

xiyar





petat
kartol

bexdenûs





tivir

fasûlî





gizêr
gêzer



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 101 16.05.19 05:40

## Navê fêkiyan li ser deftera xwe binivîse:

hirmî





tirî

hinar





sêv

pirteqal





xox

mûz





erik
alû
hilûce

zebeş
şebeş





petîx
gindor

kundir





tûerdk
çîlek



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 102 16.05.19 05:40



# 10. RENGAN NAS BIKIN

Navê rengên hûn nas dikin ji hev re bibêjin.

**Strana rengan bixwînin û bi hev re bistirin.**
**Strana rengan li dawiya pirtûkê, di pêveka 4ê de ye.**

**Bi lîstika "Ez tiştekî dibînim rengê wê (sor, zer, şîn, spî ...) ye, ka zanibe ew çi ye?" bilîzin.**



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 103 16.05.19 05:40

# ŞÎN



Ezman şîn e.
Çavên min şîn in.
Pênûsa min jî şîn e.
Derya jî şîn e.

......................................................................................................

......................................................................................................

......................................................................................................

......................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 104 16.05.19 05:40

# SPÎ



Berf spî ye.

Şîr spî ye.

Mast jî spî ye.

Pembo jî spî ye.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

# SOR





Ev gul **sor** e.
Xwîn jî **sor** e.
Qelema min **sor** e.
Lempeya **sor** dibêje:
"Raweste!"



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 106 16.05.19 05:40

# ZER



Ev kulîlk zer in

Şima jî zer e.

Zerdika hêkê zer e.

Lempeya zer dibêje:

"Amade be!"

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 107 16.05.19 05:40

# KESK



Şînayî kesk e.
Pela darê kesk e.
Giya kesk e.
Lempeya kesk dibêje:
"Bimeşe!"

.............................................................................

.............................................................................

.............................................................................

.............................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 108 16.05.19 05:40

# REŞ



Şev **reş** e.
Tenî **reş** e.
Ez bi qelema **reş** dinivîsim.
Çavên min jî **reş** in.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 109 16.05.19 05:40

# QEHWEYÎ



Ev qehwe ye.
Qehweyî rengê
qehwê ye.
Çavên te qehweyî ne.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................




# 11. XWARIN Û VEXWARINÊN KURDAN

Navê xwarin û vexwarinan
ji hev bipirsin.

**Tu çi dixwî?**
**Tu çi vedixwî?**
**Dilê te diçe çi?**
**Dilê te dibije çi?**



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 111 16.05.19 05:40

## Tu xurîniya xwe bi çi dişikînî?

Ez gezek nan dixwim.
Ez qurtek av vedixwim.
Ez ava fêkiyan vedixwim.
Ez taseke şîr vedixwim.

..........................................................................

..........................................................................

..........................................................................

..........................................................................

..........................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 112 16.05.19 05:40

# Tu danê sibehê çi dixwî û vedixwî?

Ez zeytûn û penêr dixwim.
Ez şorba nîskê (ve)dixwim.
Ez şîr û çayê vedixwim.
Ez mast û dimsê dixwim.

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 113 16.05.19 05:40

# Tu danê nîvro çi dixwî û vedixwî?

Ez tirşika bi goşt dixwim.
Ez fasûlî û savarê dixwim.
Ez dew vedixwim.
Ez qelî û zeletê dixwim.

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................

..............................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 114 16.05.19 05:40

## Tu danê êvarî çi dixwî û vedixwî?

Ez kutilkan dixwim.
Ez kovik û piraxan dixwim.
Ez ava hinaran vedixwim.
Ez meyîrê dixwim.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 115 16.05.19 05:40

# Tu paşîvê çi dixwî û vedixwî?

Ez xwarina ji ber êvarî maye dixwim.
Ez ava sûsê vedixwim.
Ez fêkiyên hişk dixwim.

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................


fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 116 16.05.19 05:40




# 12. DEM Û MEHAN NAS BIKIN

Peyvên demê ji hev bipirsin:

**Hevokan bi sê deman saz bikin:**

**DEMA NIHA**

**DEMA BORÎ**

**DEMA BÊ**

HÛN BI XWE HEVOKAN LI GOR KESÊN DIN BINIVÎSIN



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 117 16.05.19 05:40

# ÎRO

Ez îro li malê me.

Ez îro li malê bûm.

Ezê îro li malê bim.

Ez îro têm mala te.

Tu ....................................................................yî.

Tu ...............................................................bûyî.

Tê ...................................................................bî.

Ew ...................................................................ye.

Ew ........................................................ne. (kom)



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 118 16.05.19 05:40

# Kî îro li malê bû?
# Ez îro li malê bûm.

Ew ..............................................................(kit)

Em ..................................................................

Hûn .................................................................

Tu ..................................................................

Xalê min ...........................................................

Xaltiya min ........................................................

Mamê min ..........................................................

Meta min ...........................................................

Ew ..............................................................(kom)



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 119 16.05.19 05:40

# Ma em îro li malê bûn?

Ma tu ...............................................................?

Ma hûn ............................................................?

Ma ew ..............................................................?

# Na, em îro ne li malê bûn.

Na, tu ................................................................

Na, hûn ..............................................................

Na, ew ................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 120 16.05.19 05:40

# Erê, em îro li malê bûn.

Erê, tu ...............................................................

Erê, hûn .............................................................

Erê, ew ...............................................................

## SIBÊ

# Ezê sibê biçim sûkê.

Emê ..................................................................

Hûnê .................................................................

Ewê ..................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 121 16.05.19 05:40

# DOH

Ez doh çûm firoşgehê.

Ew doh çû firoşgehê.

Em ..........................................................................

Hûn ........................................................................

Ew ................................................................... (kom)

Tu ..........................................................................

Kî ...........................................................................?



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 122 16.05.19 05:40

# PÊR

Ez pêr ji kargehê hatim.

Tu pêr ji kargehê hatî.

Ew pêr ji kargehê hat.

Em ......................................................................

Hûn ....................................................................

Ew ................................................................ (kom)

Kî ....................................................................... ?



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 123 16.05.19 05:40

# ÎSAL

Îsal bihar xweş e.
Ezê îsal biçim zozanan.

Ez îsal dest bi xwendegehê dikim.

Em ..........................................................................

Hûn ........................................................................

Ew ..........................................................................

Tu ..........................................................................

Kî .........................................................................?



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 124 16.05.19 05:40

# PAR

Par bihar xweş bû.

Ez par çûm zozanan.

Par sala çûyî ye.

Em ........................................................................

Hûn ......................................................................

Ew .........................................................................

Tu .........................................................................

Kî ...........................................................................?



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 125 16.05.19 05:40

# PÊRAR

Pêrar bihar xweş bû.

Ez pêrar çûm zozanan.

Tu par na pêrar hatî vir.

Em...........................................................................

Hûn.........................................................................

Ew............................................................................

Tu...........................................................................

Kî...........................................................................?



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 126 16.05.19 05:40

# SALA BÊ

Ezê sala bê biçim deştê.

Tê sala bê biçî deştê.

Em.......................................................................

Hûn.......................................................................

Ew.........................................................................

Tu.......................................................................

Kî........................................................................?



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 127 16.05.19 05:40

# ÇILE 1



Çile sar e.
Berf çile dibare.
Çile meha zivistanê ye.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 128 16.05.19 05:40

# SIBAT 2



Sibat jî sar e.
Sibatê av diqerise.
Sibat meha herî kin
a salê ye.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 129 16.05.19 05:40

# ADAR 3



Adar destpêka
biharê ye.
Adarê giya şîn dibe.
Dar adarê dibişkivin.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 130 16.05.19 05:40

Cejna Newrozê di 21ê Adarê de ye.



Newroz cejna Kurdan e.

Agirê Newrozê geş bike.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 131 16.05.19 05:40

# NÎSAN 4



Kulîlk nîsanê dertên.
Kulîlka Nîsanê sor e.
Nîsanê kêzik û kurmik jî dertên.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 132 16.05.19 05:40

# GULAN 5



Meha dawiya biharê gulan e.
Gulan meha gul û kulîlkan e.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 133 16.05.19 05:40

# HEZÎRAN 6



Hezîran germ e.
Hezîranê xwendegeh dikevin bînvedanê.
Ez hezîranê diçim gund.

........................................................................................

........................................................................................

........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 134 16.05.19 05:40

# TÎRMEH 7



Tîrmeh pir germ e.
Ez tîrmehê diçim zozanan.

Ji tîrmehê re temmûz jî tê gotin.

..................................................................................

..................................................................................

..................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 135 16.05.19 05:40

# TEBAX 8



Tebaxê fêkî distewin.
Rojbûna min di meha tebaxê de ye.
Tebax jî germ e.

.............................................................................

.............................................................................

.............................................................................

# ÎLON 9



Îlon destpêka payîzê ye.
Ba îlonê radibe.
Îlonê hewa sar dibe.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................

# COTMEH 10



Cotmeh meheke payîzê ye.
Mirov cotmehê erd cot dike.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 138 16.05.19 05:40

# MIJDAR 11



Mijdar meha dawî ya payîzê ye.
Mijdarê berf û baran dibare û sobe tên dadan.

.....................................................................................

.....................................................................................

.....................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 139 16.05.19 05:40

# KANÛN 12



Kanûna Pêşîn

| YEKŞ. | DUŞE. | SÊŞE. | ÇARŞ. | PÊNC. | ÎN | ŞEMÎ |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | 1 | 2 |
| 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
| 10 | 11 | 12 | 13 | 14 | 15 | 16 |
| 17 | 18 | 19 | 20 | 21 | 22 | 23 |
| 24/31 | 25 | 26 | 27 | 28 | 29 | 30 |

Kanûn destpêka zivistanê ye.
Dawiya kanûnê sal jî bi dawî dibe.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 140 16.05.19 05:40

Navê mehan li gor demsalan hîn bibe:

| | | |
|---|---|---|
| ADAR | ADAR | BIHAR |
| Avrêl | Nîsan | BIHAR |
| GULAN | GULAN | BIHAR |
| Pûşper | Hezîran | HAVÎN |
| Temmûz | Tîrmeh | HAVÎN |
| Gelawêj | Tebax | HAVÎN |
| Rezber | Îlon | PAYÎZ |
| Kewçêr | Cotmeh | PAYÎZ |
| Sermawez | Mijdar | PAYÎZ |
| Berfanbar | Kanûn | ZIVISTAN |
| Rêbendan | Çile | ZIVISTAN |
| Reşemî | Sibat | ZIVISTAN |



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 141 16.05.19 05:40

# BIHAR



Bihar demsala yekem e.
Biharê berf dihele.
Biharê giya şîn dibe.
Biharê pez dizê.

Sê mehên biharê hene:
Adar, Nîsan, Gulan

Hûn biharê li derdora xwe çi dibînin, binivîsin:

..................................................................................

..................................................................................

..................................................................................

..................................................................................

..................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 142 16.05.19 05:40

# HAVÎN



Havîn demsala duyem e.
Havîn demsaleke germ e.
Zad havînê diseride.

Sê mehên havînê hene:
Hezîran,Tîrmeh, Tebax

Hûn havînê li derdora xwe çi dibînin, binivîsin:

..................................................................................

..................................................................................

..................................................................................

..................................................................................

..................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 143 16.05.19 05:40

# PAYÎZ



Payîz demsala sêyem e.
Payîzê ba radibe.
Payîzê dar pelên xwe diweşînin.

Sê mehên payîzê hene:
Îlon , Cotmeh , Mijdar

Hûn payîzê li derdora xwe çi dibînin, binivîsin:

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 144 16.05.19 05:40

# ZIVISTAN



Zivistan demsala çarem e.
Zivistan sar e.
Zivistanê baran û berf dibare.

Sê mehên zivistanê hene:

Kanûn, Çile, Sibat

Hûn zivistanê li derdora xwe çi dibînin, binivîsin:

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 145 16.05.19 05:40

# SAL

Di salekê de 12 meh hene.
Di salekê de 52 hefte hene.
Di salekê de 365 roj hene.

..........................................................................................

..........................................................................................

# MEH

Di mehekê de 30 roj hene.
Hin meh 31 roj û meha Sibatê jî ji çar salan carekê 29 rojan, wekî din 28 rojan dikişîne.
Di mehekê de 4 hefte hene.
Hefteyek dike heft roj.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 146 16.05.19 05:40

# ROJ

Di rojekê de 24 saet hene.
Rojek ji şev û rojê pêk tê.
Sibe, nîvro, êvar û şev danên rojê ne.

..........................................................................................

..........................................................................................

# DANÊN ROJÊ

Sibe, Nîvro, Êvar, Şev
Sibe û Nîvro ronahî ne.
Êvar û Şev tarî ne.

..........................................................................................

..........................................................................................

..........................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 147 16.05.19 05:40

Roj sibehê derdikeve.
Roj nîvro bilind dibe.
Roj êvarî diçe ava.
Roj bi şevê nayê dîtin.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................

Bi şev hîv û stêrk derdikevin.
Şev tarî ye.
Mirov bi şev radize.
Mirov bi roj kar dike.

.................................................................................

.................................................................................

.................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 148 16.05.19 05:40

# NAVÊ ROJAN

| | | |
|---|---|---|
| Yek: | YEKŞEM | ................................... |
| Du: | DUŞEM | ................................... |
| Sê: | SÊŞEM | ................................... |
| Çar: | ÇARŞEM | ................................... |
| Pênc: | PÊNCŞEM | ................................... |
| Şeş: | ÎN | ................................... |
| Heft: | ŞEMÎ | ................................... |

- Di hefteyekê de heft roj hene.
- Yekşem roja bînvedanê ye.
- Li hin welatan roja înê roja bînvedanê ye.
- Duşem roja despêkirina kar e.
- Şemiyê hefte bi dawî dibe.
- Çarşemê piştî nîvro dersa min a muzîka Kurdî heye.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 149 16.05.19 05:40

# DEMJİMÊR/KATJIMÊR

Demjimêr “SAET” e.
Demjimêrek 60 hûrdem e.
Hûrdem, deqîqe ye.
Hûrdemek 60 çirk e.
Çirk, saniye ye.
Çirkek 60 sanîse ye.
Saetek ji çar çarîkan pêk tê.
Her çarîkek 15 hûrdem e.
Du çarîk dikin nîv saet.

.............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................

............................................................................................

.............................................................................................

.............................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 150 16.05.19 05:40

# SAET ÇEND E?

Demjimêr çend e?
Saet sê ye.
Demjimêr sê ye.
Demjimêr sisê ye.




.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................

.......................................................................................

Di roja niha de ji ber pêşketinên teknîkî ji bo gotina demê ya bi riya saetê êdî awayê dîjîtal jî tê bikaranîn. Wek mînak:
Ji bo 6 û nîvê êvarî dibêjin
18 û 30



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 151 16.05.19 05:40



Saet
duwazdeh e.



Saet
yazdeh e.



Saet
çar û nîv e.



Saet
neh û çarîk e.



Saet yazdeh û
bîstûpênc e.



Saet
neh e.



Saet sisê kêm
bîst e.



Saet neh û
bîstûpênc e.



Saet sisê û
bîstûpênc e.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 152 16.05.19 05:40

# SAET ÇEND E, HÛN BI XWE BINIVÎSIN:



















fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 153 16.05.19 05:40








# 13. LÎSTIK

Lîstikan bixwînin û bilîzin.

**BI RIYA LÎSTIKAN XWENDINA KURDÎ HÎN BIBIN.**



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 154 16.05.19 05:40

## Kerka Kera Ço!

Lîstikvan yek li paş yekî rêz dibin. Kes li paş xwe nanêre. Yek ji paş ve tê û çavê yekî bi destên xwe digire. Pîrik ji yê çavê wî hatiye girtin dipirse:

"Kerka kera ço, kî te diajo?" Lîstikvanê jê tê pirsîn navê kesê çavê wî girtiye dibêje. Ger rast bibêje bi ser dikeve, ger rast nebêje winda dike. Dema winda bike, yê çavê wî girtiye lê siwar dibe û wî sê gavan diajo ...

## Çavgirtînk

Zarokek berê xwe dide dîwêr, çavê xwe digre û zarokên din xwe vedişêrin. Zarokê çavê xwe girtiye pîrik e. Ji bo kesek li derdora wî nemîne, dema hijmartina heta bîstan diqedîne, dibêje:

"Kî li çepê min li rastê min, li paş min, li derdora min hebe ew şewitî..." Û pişt re çavê xwe vedike, diçe li zarokên din digere.

Di vê navberê de, divê lîstikvanên din hişyar û jîr bin ku bêyî pîrik wana bibîne, bazdin û destê xwe li dîwarê pîrik li ber bû bidin. Kî destê xwe lê bide ew bi ser dikeve, lê pîrik kê bibîne, ew dişewite. Divê pîrik li ber dîwêr nemîne, here li lîstikvanan bigere, lê hay ji dîwêr jî hebe.


fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 155 16.05.19 05:40

# Destmalka Min Li Paş Kê?

Lîstikvan wek xelekekê li kêleka hev rûdinin, yek ji wan di paş wan re destmalkê digerîne û dibêje:

"Yek, du, sê, destmalka min li paş kê?"

Lîstikvanên rûniştine jî bi çepikan pê re dibêjin. Pişt re kesê destmalk di dest de destmalkê datîne paş yekî û baz dide. Dema destmalkê datîne lîstikvan gotina "Yek, du, sê, destmalka min li paş kê?" bi lez dibêjin û li çepikan didin.

Lîstikvanê bi xwe bihise, radihêje destmalkê û dide pey kesê destmalk daniye paş wî. Divê ewê baz dide, li ciyê yê rabûye rûne. Ger ew berî rûne were girtin, ew dişewite û tê di nava xelekê de rûdine, heta yekî din bişewite li wir dimîne.

Lîstikvanên destmalkê datînin, divê her dem daneynin pey heman kesî û lîstikvanên din jî tev li lîskê bikin.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 156 16.05.19 05:40

## Sar An Germ?

Lîstikvanê li tiştê were veşartin bigere derdikeve derve. Lîstikvanên li hundir, bi hev dişêwirin û tiştekî di ciyekî de vedişêrin. Piştre yê li derve tê hundir û lê digere.

Dema ji tiştê veşartî dûr dikeve tev bi hev re dibêjin: "Sar, sar, sar," dema nêzîkatiyê lê dike dibêjin: "Germ, germ, germ."

Bi vî awayî dikin ku zarok tiştê veşartî bibîne, lê ciyê wê tam nabêjin, divê ew bi xwe bibîne. Dema dibîne, ew tev li yê vedişêrin dibe û yê veşartiye derdikeve derve.

Lîstik bi vî awayî heta hemû lîstikvan tev li karê veşartin û dîtinê dibin, didome.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 157 16.05.19 05:40



# 14. ÇÎROK Û ÇÎVANOK

Çîrok û çîvanokan bixwînin.

**BI RIYA ÇÎROK Û ÇÎVANOKAN XWENDINA KURDÎ HÎN BIBIN.**



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 158 16.05.19 05:40

# ŞÊR, PILING Û ROVÎ

Du afirandeyên xurt ên cîhana ajalan şêr û piling, bûbûn heval. Rojekê dema bi hev re dimeşiyan, diçûn, li ser rêkê qetekî mezin ê penêrê ji gundiyan ketiye dîtin.








fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 159 16.05.19 05:40

Penêr hilgirtin û meşiyan. Him dimeşiyan û him penêr dixwarin. Hinekî şêr ji penêr xwar, hinekî piling...
Carekê piling bi gazindokî got:
- Hevalo, tu ji min zêdetir dixwî.
Şêr bi ser de hel bû û got:
- Na, ji xwe tu ji min zêdetir dixwî.
Gava wilo gengeşe kirin: "Tu zêde dixwî, ez kêm dixwim", li hev nekirin û lihevnekirin vegeriya pevçûnê. Dest bi lêdana hev a lepûşkan kirin û gez ji hev dan.
Piştî demekê pev çûn, piling têgihişt ku wê têk biçe û wî got:





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 160 16.05.19 05:40

- Wer em herin ba rovî. Rovî ajalekî zana ye. Ewê ji me re çareseriyekê bibîne.
Şêr jî pêşniyaza piling qebûl kir. Dev ji pevçûn û pevketinê berdan û ji bo çûna ba rovî ketin ser rê.



Bêyî kêm û zêde biçin,
gelî û çiyan derbas bikin,
rovî ji pêşberê xuya bû,
hat ba wan û got:
- Xêr e, wilo we mil daye hev hûn diçin ku?
Rovî fenek fenek keniya.
Çav li penêr ketibû.
Av bi devê wî ket.
Şêr û pilingî got:
- Em jî dihatin ba te.
Lê derketin û hatina te baş bû.
Tiştê di serê wana re derbas bûye ji rovî re vegotin.
Rovî wiha diyar dikir ku bi dil û can li wan guhdarî dike, lê belê di dilê xwe de kix kix dikeniya û çavê xwe ji ser penêr venediqetand. Rovî di ber xwe de got:


fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 161 16.05.19 05:40

-Çi ajalên xêvik (bêhiş) hene li vê cîhanê. Nizanin qismetê derketiye pêşiya wan jî bixwin. Ez derseke baş bidim wana, bila hişê wan were serê wan.
Şêr û pilingî got:
- Em ji te dixwazin, tu vî penêrî li me parve bikî.
Rovî got:
- Ji bo ez karibim vî penêrî wek hev parve bikim, divê mêzênek hebe. Rabin ji van nêzîkan ji min re mêzênekê bînin.
Şêr û piling wilo derdor saxtî kirin û wê gavê şêr mêzênek dît. Mêzên anî û li ber rovî danî.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 162 16.05.19 05:40

Rovî got:
- Ka wî penêrî bidin min, ez binêrim.
Roviyê fenek ê penêr girt, qetekî mezin danî şkevikeke mêzênê û qetekî biçûk jî danî şkevika din. Tewşa mêzênê xera kir.



Bi awayekî xwezayî şkevikek giran ket, yek li jorê ma. Qaşo ji bo bibin wek hev, ji şkevika giran ketiye qetekî mezin jêkir û avêt devê xwe.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 163 16.05.19 05:40

Giranî vê carê derbasî şkevika din bû. Ji wê jî gepek jêkir û xwar. Bi jêkirin û xwarina penêr a rovî, şkevikên mêzênê qet nedibûn wek hev. Bi gotina gepek ji vê şkevikê, gepek ji şkevika din, êdî penêr xelas kir. Li holê ji mêzênê pêve tiştek nema. Ji fêdedîtina matmayîna şêr û piling, rovî reviya û çû.



Heta şêr û piling bi ser hişê xwe hatin, roviyî heft fitlonek dan xwe û di ser heft kaşan re qulipî û heft newal derbas kir.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 164 16.05.19 05:40

# GUR Û HEFT KARIK



Hebû carek ji caran, xêr û xweşî bibare li hazir û guhdaran...
Hebû tinebû, carekê bizineke pîr û heft karikên wê hebûn. Çawa her dayik ji zarokên xwe hez dike, wê jî wisa ji karikên xwe hez dikir. Rojekê, bizinê xwest ji bo biçêre biçe zozanan, guhanên xwe tije şîr bike û bîne zikê karikên xwe têr bike. Berî ew derkeve tembî li karikên xwe kir û got:



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 165 16.05.19 05:40

- Karikên min ên delal, niha ezê herim zozanan, lê divê hûn derî ji ti kesî re venekin û bi taybetî hay ji gur hebin ha! Ger gur bikeve hundir, ewê we hemûyan bi carekê re daqurtîne. Ew pir fenek e haa! Lê bila di bîra we de be. Dengekî wî yê stûr, lingên wî yên reş hene. Hûnê bi wî rengî karibin wî nas bikin. Ji xwe dema ez vegerim, ezê vê stranê ji we re bibêjim:

*Şenga min Penga min*
*Dayik çûye zozanan*
*Xwariye pelên kizwanan*
*Şîr ketiye guhanan*
*Zû bikin, derî vekin*
*Dayik hatiye danan*

Karikan got:
- Bila dilê te rehet be dayê, emê hay ji xwe hebin û ji xeynî te jî, derî li ti kesî venekin.
Çima di wê kêliyê de gurê fenek jî di ber derî re derbas nedibû!
Gotinên dawî yên bizinê ji karikên xwe re got, çûn guhên gur jî.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 166 16.05.19 05:40



Piştî derketina bizina pîr a bi dilekî rehet, karikan jî derî girt. Wê kêliyê gur hat li derî xist û bi dengê xwe yê stûr got:

*Şenga min Penga min*
*Dayik çûye zozanan*
*Xwariye pelên kizwanan*
*Şîr ketiye guhanan*
*Zû bikin, derî vekin*
*Dayik hatiye danan*



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 167 16.05.19 05:40

Lê belê karikan ji dengê wî yê stûr gur nas kir û bi qêrîn got:
- Em derî ji te re venakin! Tu ne dayika me yî! Dengê dayika me zirav û şêrîn, lê dengê te qalind e. Em dizanin, tu gur î!
Gur zûzûka çû bazarê û ji wir hinek kils kirî. Wî ew kils xwar û dengê wî pir zirav bû. Pişt re jî ew vegeriya malê, li derî da û vê carê bi dengê xwe yê zirav ew stran got:

*Şenga min Penga min*
*Dayik çûye zozanan*
*Xwariye pelên kizwanan*
*Şîr ketiye guhanan*
*Zû bikin, derî vekin*
*Dayik hatiye danan*

Karikan pêşî got qey diya wan hatiye, lê pişt re hizirîn ku dibe ewê li ber derî dîsa gur be. Îcar wan ji gurî re got:
- Ka lingên xwe di qula derî re şanî me bide.
Gur di bin derî re lingên xwe şanî wan da. Karikan got:


fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 168 16.05.19 05:40

- Ev ne lingên dayika me ne! Lingên dayika me spî, lê yên te reş in. Na, na! Tu ne dayika me yî, tu gur î! Em derî li te venakin.

Gur pir aciz bû, lê lazim bû ji bo xapandina wan riyek bidîta. Îcar ew rabû hahakê çû ba nanpêjekî û jê re got:

- Nanpêjê delal, piyên min kul bûne! Ji kerema xwe tu dikarî hinek hevîr deynî ser piyên min!?





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 169 16.05.19 05:40

Nanpêj hinek hevîr çêkir û danî ser piyên gur. Gur vê carê çû ba aşvanekî û got:
- Ji kerema xwe re ka hinek arvan li piyên min bike.
Aşvan fikirî û di dilê xwe de got: “Herhal gur dixwaze dîsa yekî bixapîne.” Û ji ber wê yekê, aşvanî xwe li kerrîtiyê danî û daxwaza gur neanî cî. Lê belê gurî got:
- Ku tiştê ji te re dibêjim tu pêk neynî, ezê te bixwim haa!
Aşvan tirsiya û rabû hinek arvan li ser piyên gur reşand û piyên wî spî bûn.
Cara siseyan gurê fenek dîsa çû ber deriyê mala bizin û karikan. Wî li derî da û bi dengekî zirav got:

*Şenga min Penga min*
*Dayik çûye zozanan*
*Xwariye pelên kizwanan*
*Şîr ketiye guhanan*
*Zû bikin, derî vekin*
*Dayik hatiye danan*

Karik qêriyan û wan got:
- Ka lingên xwe di bin derî re şanî me bide, ji bo em zanibin, tu bi rastî dayika me yî yan na!



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 170 16.05.19 05:40

Gur lingên xwe yên arvankirî di bin derî re şanî wan da û gava karikan dît ling spî ne, dilê wan xweş bû û wan got:

- Ev dayika me ye, dayika me. Hem deng zirav e, hem jî ling spî ne.

Karikan bi lez û bez derî vekir. Lê derî çawa vebû venebû, gur ket hundir û xwe gij kir ser wan. Karik pir tirsiyan û xwestin xwe veşêrin.



Yekî ji wan xwe xist binê maseyê, yekî xwe xist binê nivînan, yekî xwe xist nava sobeya vala, yê çarem li mitbexê, yê pêncem li hundirê dolabê, yê şeşem li binê destşokê û yê heftem jî di nav saeta dîwêr de xwe veşart.

Gur ew yeko yeko dîtin û bi carekê re avêtin devê xwe. Lê gur tenê nikarîbû ew karikê xwe di nav saeta dîwêr de veşartibû, bibîne.

Jixwe ji ber ku zikê gur jî têr bûbû, wî devê xwe alast û çû xwe li derve, li bin darekê, li ser şînayiyan dirêj kir û raket.

Piştî demeke kin, dayika karikan, yanî bizin ji zozanan vegeriya... Çi bibîne!

Deriyê mezin ser piştkî vekirî bû. Mase, kursî, destşok û nivîn şikiyabûn û tev li erdê belawela bûbûn.

Bizin bi saw û tirseke mezin li karikên xwe geriya, lê bêfêde bû. Wê bi dorê bi navê wan bang li wan kir, lê ti bersiv ji kesî derneket. Tenê dema bizinê navê karikê xwe yê herî biçûk got, dengekî zirav hat bihîstin:

-Ez li vê derê me dayê, di nav saetê de me!



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 172 16.05.19 05:40



Bizinê çû karika xwe ji nav saetê derxist û girt hembêza xwe. Karika biçûk jî ji diya xwe re got ku gur hatiye û karikên din hemû daqurtandine ...
Îcar hûn bihizirin, bê bizina pîr li ser karikên xwe çiqase rondik barandine.
Bizina pîr bi xemgînî ji malê derket, karika biçûk jî da dû diya xwe. Gur, li bin darekê, li ser şînayiyan xwe dirêj kiribû, û ketibû xeweke wiha giran, ku xurexur û pifepifa wî bû. Bizinê çû ji nêz ve li zikê gur nêrî û ferq kir, tiştek di zikê wî yê mezin de dilebite û dileqe.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 173 16.05.19 05:40

Bizinê got:

-Xwedayo, karikên min ên biçûk yên gur ew xwaribûn, gelo hê jî zindî ne?

Îcar bizin bi lezûbez çû malê, meqes û ta û derzî anî, zikê gurê fenek bi meqesê qelaşt û yeko yeko hemû karikên xwe jê derxist.



Rewşa hemû karikan gelekî baş bû. Ew zindî bûn, ji ber ku gur hingî lez kiribû, hema wî hemû karik bêyî bicû, bi carekê re daqurtandibû. Îcar ew çi dilxweşiyek bû, ji bo bizinê û ji bo karikan!..

Bizina pîr ji karikên xwe re got:
- Rabin delalên min, de zû herin keviran bînin, bila kevirên wisa mezin bin ha! Hîn berî gur ji xewê şiyar bibe, emê zikê gur bi keviran dagirin.
Her heft karik çûn kevirên mezin gindirandin anîn û heta ber dev, zikê gur bi keviran dagirtin.
Bêyî ku haya gur jê çêbibe, bizina pîr zûzûka zikê wî dirût û çû xwe tevî karikên xwe, li pişt darekê veşart. Dema gurê çavbirçî ji xew şiyar bû, rabû ser xwe. Lê ji ber wan kevirên mezin, ew wisa tî bûbû, xwest here ji bîrekê hinek av vexwe. Lê belê dema ew ber bi bîrê ve dimeşiya kevirên di zikê wî de li hev diketin û dikirin gurmegurm. Îcar gurê zikmezin got:
Ev çi gurmegurma zikê min e? Min şeş karik daqurtandin lê gelo ew xewnek bû?
Gur heta bîrekê bi zorê meşiya, piştre xwe bi ser bîrê de daqûl kir û hinek av vexwar. Lê belê kevirên di zikê wî de wiha giran bûn, ew bi carekê re ket hundirê bîrê û bi awayekî pir xirab di nav ava bîrê de xeniqî. Îcar heft karik tevî diya xwe bi bazdan


fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 175 16.05.19 05:40

hatin, li dora bîrê bi dilxweşiya rizgarbûna ji gur dîlan girtin û piştre jî çûn mala xwe. Çîroka me li vir qediya, xêr û xweşî li hazir û guhdaran bariya.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 176 16.05.19 05:40

## VAN PIRSAN BIBERSIVÎNIN:

1- Di vê çîrokê de çend ajal hene?

Di vê çîrokê de .................................. ajal hene.

a- Çend gur hene? : ........................................ heye.

b- Çend bizin hene? :..................................... heye.

c- Çend karik hene? : .................................... hene.

2- Kî dixwaze karikan bixwe?

..................................... dixwaze karikan bixwe.

3- Dayika karikan ji wan re kîjan stranê dibêje?:

Şenga min, Penga min
Dayik çûye ...........................................................................
Xwariye pelên .................................................................
Şîr ketiye .........................................................................
Zû bikin, derî ..................................................................
Dayik hatiye ....................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 177 16.05.19 05:40

4- Karikê ji ber gur xelas dibe, xwe di ku derê de vedişêre?

Karik xwe di nav ........................................ dîwêr de vedişêre.

5- Dayik çi ji gur dike?

Bi cawbir ............................................... gur vedike

û karikên xwe jê derdixe, piştre zikê

gur tije ................................................................ dike.

6- Çi bi serê gur de tê?

Gur ................................ ser bîrê, ji bo ....................

vexwe. Lê belê ji ber zikê gur tije

.............................. in, gur dikeve hundirê

.............................. û ew ..................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 178 16.05.19 05:40

# DAYIKA XWE Û BAVÊ XWE BIDE NASÎN

Destpêkê dayika xwe bide nasîn.
Piştre li ser dayika xwe binivîse, bê:

a. Dayika te çi karî dike?

..........................................................................................................................

b. Dayika te ji çi hez dike?

..........................................................................................................................

c. Dayika te ji çi hez nake?

..........................................................................................................................

ç. Dayika te ji te re kîjan çîrokan dibêje?

..........................................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 179 16.05.19 05:40

Niha jî bavê xwe bide nasîn.

Piştre li ser bavê xwe binivîse, bê:

a. Bavê te çi karî dike?

..............................................................................................................

b. Bavê te ji çi hez dike?

..............................................................................................................

c. Bavê te ji çi hez nake?

..............................................................................................................

ç. Bavê te te dibe li ku derê digerîne?

..............................................................................................................



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 180 16.05.19 05:40






## 15. STRAN

Stranan bixwînin, guh bidin ser û di ber re bistirin!

**BI RIYA STRANAN XWENDINA KURDÎ HÎN BIBIN.**



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 181 16.05.19 05:40

# ZIMANÊ KURDÎ

Bi xeml û rewş e, şêrîn û xweş e
Şêrîn û xweş e, zimanê Kurdî
Bi xweş awaz e, letîf û naz e
Letîf û naz e, zimanê Kurdî

Beyta Feqî ye, kubra Xanî ye
Kubra Xanî ye, zimanê Kurdî
Bi xeml û rewş e, şêrîn û xweş e
Şêrîn û xweş e, zimanê Kurdî

Kewkeb çiyan e, kubra Teyran e
Kubra Teyran e, zimanê Kurdî
Bi xeml û rewş e, şêrîn û xweş e
Şêrîn û xweş e, zimanê Kurdî



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 182 16.05.19 05:40

# MALAN BAR KIR

Malan bar kir lê lê çûne waran lê
Dînê lê dînê lê Dînara min
Goştê me xwar lê lê mişk û maran lê
Keçê lê rindê lê bermaliya min

Ez sewî me lo lo ber desta me lo
Delalo delalo delalê min
Brîndar im lo lo bê xwedî me lo
Hevalo hevalo hevalê min

Malan bar kir lê lê koç bi rê ket lê
Dînê lê dînê lê Dînara min
Dilêm eşiya lê lê agir pê ket lê
Keçê lê rindê lê bermaliya min

Malan bar kir lê lê çûne waran lê
Dînê lê dînê lê Dînara min
Malan bar kir lê lê çûne waran lê
Dînê lê dînê lê Dînara min



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 183 16.05.19 05:40

# HA GIDÎ MIŞKO

Harna nîna nîrna nîna
Nîna nîna narna nîna
Ha gidî mişko de gidî mişko
Tu dijminê nanê hişko
Ha gidî de gidî ha gidî de gidî
Ha gidî de gidî ha gidî de gidî

Ha gidî mişkê wisa kovî
De gidî mişkê wisa kovî
Tûr û barê me kir nêvî
Ha gidî de gidî ha gidî de gidî

Harna nîna nîrna nîna
Nîna nîna, narna nîna
Ha gidî mişkê wî arisî
De gidî mişkê wî arisî
Li me nehişt nan garisî
Bir û xwaro pê fetisî
Ha gidî de gidî ha gidî de gidî
Harna nîna nîrna nîna
Nîna nîna narna nîna



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 184 16.05.19 05:40

# ŞEMAMÊ

Şemamê şemamê şemamê bûkê
Dotmamê dotmamê dotmamê biçûkê
Şemamê şemamê şemamê bûkê
Dotmamê dotmamê dotmamê biçûkê
Şemam qîza mele şemamê bûkê
Dotmam qîza mele dotmamê biçûkê
Şemam qîza mele şemamê bûkê
Dotmam qîza mele dotmamê biçûkê
Genim da ser kele şemamê bûkê
Genim da ser kele dotmamê biçûkê
Şemamê şemamê şemamê bûkê
Dotmamê dotmamê dotmamê biçûkê
Şemamê şemamê şemamê bûkê
Dotmamê dotmamê dotmamê biçûkê
Şemam qîza metê şemamê bûkê
dotmam qîza metê dotmamê biçûkê
Şemam qîza metê şemamê bûkê
dotmam qîza metê dotmamê biçûkê
Eslê xwe egîdê şemamê bûkê
Eslê xwe egîdê dotmamê biçûkê
Şemamê şemamê şemamê bûkê
Dotmamê dotmamê dotmamê biçûkê
Şemamê şemamê şemamê bûkê
Dotmamê dotmamê dotmamê biçûkê



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 185 16.05.19 05:40

# HÛR HÛR LÊXIN GOVENDÊ

Hûr hûr lêxin govendê
wer bûka mala bavê min
Hûr hûr lêxin govendê
wer bûka mala bavê min
Li çar hêlan deng vedin
wer bûka mala bavê min
Li çar hêlan deng vedin
wer bûka mala bavê min

Pahniya solan li erdê xin
wer bûka mala bavê min
Pahniya solan li erdê xin
wer bûka mala bavê min
Toz û xewarê pêxin
wer bûka mala bavê min
Toz û xewarê pêxin
wer bûka mala bavê min
Vê govendê geş bikin
wer bûka mala bavê min
Vê govendê geş bikin
wer bûka mala bavê min



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 186 16.05.19 05:40

Bûka xwe dilxweş bikin
wer bûka mala bavê min
Bûka xwe dilxweş bikin
wer bûka mala bavê min
Navê bûkê Gulistan
wer bûka mala bavê min
Navê bûkê Kurdistan
wer bûka mala bavê min
Evîna hemû dilan
wer bûka mala bavê min
Evîna hemû dilan
wer bûka mala bavê min

Hûr hûr lêxin govendê
wer bûka mala bavê min
Hûr hûr lêxin govendê
wer bûka mala bavê min
Li çar hêlan deng vedin
wer bûka mala bavê min
Li çar hêlan deng vedin
wer bûka mala bavê min



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 187 16.05.19 05:40

# GULFIROŞ

*Ez ji xew rabûm, gulfiroşek dî*
*pir gelek şa bûm, gul bi dil didî*
*gul bi dil didî*

*Hebû me yek dil, tev jan û kul bû*
*ne bûme bawer, gul bi dil bidî*
*gul bi dil bidî*

*Bazar me kir, go ser bi ser nadim*
*ê gulperest bî, can û dil didî*
*can û dil didî*

*Min go kî didî, can û dil bi gul*
*go ev bazar e, dil bi kul didî*
*dil bi kul didî*

*Min can û dil dan, dil kiriye qêrîn*
*go ho Cegerxwîn, dil bi gul didî*
*dil bi gul didî.*

Cegerxwîn



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 188 16.05.19 05:40





# 16. WÊNEXÊZÎ, BOYAXKIRIN Û JÊKIRIN

Wêneyan xêz bikin, birengînin û bi jêkirinê lîstokan çêbikin.

**BI RIYA WÊNE Û LÎSTOKAN DEMEKE XWEŞ BIBORÎNIN**





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 190 16.05.19 05:40





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 191 16.05.19 05:40





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 192 16.05.19 05:40





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 193 16.05.19 05:40





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 194 16.05.19 05:40



## Kaxezan bibirin û lîstokan çêbikin!





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 195 16.05.19 05:40



Kaxezên rengîn bibirin û lîstokan çêbikin!





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 196 16.05.19 05:40



# 17. XWENDINA XWE BI PÊŞ DE BIBIN

Çîrokan bixwînin
û xwendina xwe bi pêş de bibin!

**BI RIYA ÇÎROKAN
XWENDINA KURDÎ
BI PÊŞ DE BIBIN.**



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 197 16.05.19 05:40

# KER Û HÊŞTIR



Ker û hêştir li herî dawî ya kerwanê bar dimeşiyan. Wan dixwest ji kerwên veqetin. Bêyî eşkere bikin, meşa xwe dan kêmkirin. Kêliyeke din ji kerwên veqetiyan.
Bi coşa gihiştina azadiya xwe seranseriya rojê meşiyan û geriyan. Warekî têr av û şînayî dîtin û zikê xwe dagirtin. Mirov, bar, lêdan, her tişt li paş mabû û niha bi tena serê xwe mabûn. Ew êdî azad û bextewar bûn.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 198 16.05.19 05:40



Li warê têr av û şînayî demekê man. Kesê li wan bipirse, bigere tinebû. Rehetiya wan li cî û xweş bû. Ji sibehê heta êvarî diçêriyan û vedihisiyan. Bi kêfa azadbûnê ker dicoşiya. Dilê wî dikir pire pir. Zîvirî ser hêştirê û got:

- Ez ji mirovan û ji bar filitîm, êdî dilê min di hinava min de hilnayê. Dilê min dixwaze bistirim. Ezê derkevim serê vî girî û heta dengê min dertê bistirim. Hêştir qilqilî. Li ber kerî geriya û got:

- Eman birayê ker, tu çi dikî? Ma niha dema stran û zirînê ye? Ger dengê te bigihê guhê mirovan, tê xerabiyekê bi serê me de bînî. Ma ji nû ve em bibin hêsîrê mirovan? Te hişê xwe winda kiriyî? Wer meke, nabe!



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 199 16.05.19 05:40



Lê kerî guhdarî li hêştirê nedikir û digot: "Tu tu gidî hêştira newêrek"  û  ber bi gir ve dimeşiya. "Dilê min niha wek behran dicoşe. Ez wekî te ne tirsonek im. Him li van deran çi karê mirovan heye?"
Kerê derket ser navsera gir, heta dengê wî derket zirya û dest bi zirîneke dirêj kir. Dengê wî yê kirêt vegirt her derê. Derûdor hejand û rawestiya. Zirîna kerî gihişt kerwanekî bazirganan ê di wan nêzîkan re derbas dibû. Xwediyên kerwên di navbera xwe de got:
-Xuya ye li van nêzîkan gundek heye.
Ew ji rê veqetiyan û ber bi aliyê zirîn jê hatiye ve meşiyan. Wan ker û hêştir dît. Têgihiştin ku ew bêxwedî ne. Barek sabûn ji barê ajalên din dan



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 200 16.05.19 05:40



ser piştа kerî û riya xwe domandin.
Ker û hêştir dîsa li kêleka hev bûn. Bi barên xwe yên giran herdu jî bi kotekî dimeşiyan. Hêştirê got:
-Te eciband tiştê te kiriyî? Ger te guhdarî li min kiriba, ev tev nedihatin serê me. Ma dema zirînê bû? Dîsa mirov, dîsa bar, dîsa lêdan... Xuya ye em liyaqê vê ne. Kî dizane ji vê û şûn de emê hîn çi êşê bikişînin?
Kerî ji hêştirê re tiştek negot. Bi kerwên re dimeşiyan û diçûn. Ker li riyeke xelasbûna ji bar digeriya.
Piştî azadiyê hilgirtina bar jê re zahmet bûbû. Kêliyeke din lingê xwe li berekî mezin xist. Xwe kulek kir û nemeşiya.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 201 16.05.19 05:40

Xwediyên kerwên rewşa kerî dît û dilê wan pê şewitî. Wan got: "Barê hêştirê hindik e." Û ker û barê wî jî avêtin ser pişta hêştirê.
Hêştir bi fena kerê hisiyabû. Dengê xwe dernexist. Di dilê xwe de got:
- Kero, ezê şanî te bidim!



Bêyî bide diyarkirin rêka xwe domand. Dilê wê pir ji kerî mabû. Divîbû tola xwe veda û cezayê kerî bidayê.
Riya kerwên di çiyê re derbas dibû. Aliyekî çiyê kevande bû. Dema hêştirê kevande dît, biryara xwe da: Wê ker di kevandeyê re biavêta xwarê. Lê ji ber bi kerî re hevaltî kiribû, dilê hêştirê dest nedida ker bimire. Dema dît di jêra kevandeyê re av dibore, êdî biryara xwe da.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 202 16.05.19 05:40



Hêştirê dest pê kir xwe virde wirde hejand û lotik dan xwe. Ker tirsiya û bi kelecanî got:
-Tu çi dikî xwişka hêştir?
Hêştirê bi henekî got:
-Qeett. Dilê min dixwaze hinekî bilîzim. Ew zirîna te ya xweş, ew stranên te yên bedew qet ji hişê min dernayên. Dema ez derketim ciyê bilind, stranên te hatin bîra min û dilê min coşiya.
Min got, kêliyekê bidim lotikan.
Kerê got:
-Ma tu dîn bûyî xwişkê? Ma vê derê ciyê lotikdanê ye? Qey tu kevandeyê nabînî? Dev ji tevzê berde.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 203 16.05.19 05:40

-Tevz mevz. Te doh stran negotiba, min jî îro nedida lotikan. Ger te wê rojê li min guhdarî bikira û neziriyaba, îro minê jî li te guhdarî bikira û min nedida lotikan. Te ez di azadiyê de hêsîr xistim. Aha ji te re xelata stranbêjî û zirînê.

Ker gindirîbû binê kevandeyê jî. Di nava çêm de li ber xwe dida.

Ji ber barê kerî sabûn bû, hêştirê bi pey de keniya û got:

-Xwe baş bişo birayê ker, xweşî be!





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 204 16.05.19 05:40





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 205 16.05.19 05:40

# KEW û ROVÎ



Roviyê ji bo nêçîrê digeriya li kewê rast hat. Dema çav li kewê ket şorika devê wî herikî. Divîbû riyek bidîta, kew bixista xefkê û bixwara. Derbasî pêşberî kewê bû û rawestiya. Heyran heyran li kewê dinêrî. Li ser nêrîna baldar a roviyî, kewê pirsî û got:





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 206 16.05.19 05:40

- Kekê rovî, çima tu wilo heyran heyran li min dinêrî?
Rovî got:
- Çawa ez nenêrim! Ew çavên te, ew awirên te, hişê min ji serê min bir. Tu pir xweşik î. Ez dihizirim, bê gelo dema tu çavên xwe digirî jî wilo xweşik î. Kêliyekê tu çavên xwe bigirî û ez wilo li te binêrim!
Kewê got:
- De baş e, ez bigirim. Û wê çavên xwe girt.



Rovî di cih de xwe avêt ser û kew girt. Kewê hew dizanîbû çi bi serê wê hat. Dereng bi fena rovî hisiyabû. Ji bo xwe ji vê rewşê xelas bike, hizirî û got:



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 207 16.05.19 05:40

- Wa roviyê zane, bi rastî helal be ji te re. Te xwarina min heq kir. Ez gepa şah û padîşahan im, lê mixabin Xwedê ez kirim qismetê te. Ma berî tu min bixwî, navê ku tu ji Yezdan re bibêjî: "Mala te ava"?



Rovî got:
-Belê, tu rast dibêjî. Û ji bo ji Yezdan re bibêje malava devê xwe vekir. Kewê di cih de got pirrr û firiya, ji devê rov filitî.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 208 16.05.19 05:40



Roviyê acizbûyî got:
- Ne bixêr be li wî kesê, bêyî gepa xwe bixwe, bibêje mala te ava.
Kewê gotina rovî bihîst, xwe jê kêm nehişt û got:
- Ne bixêr be ji wê kesê re, hîn xewa wê nehatiye, çavê xwe digire.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 209 16.05.19 05:40

# 18. SERSAL, NEWROZ, BÛKA BARANÊ, ZÛGOTINK Û METELOKÊN KURDÎ




Dewlemendiya wêjeya Kurdî nas bikin.

**BIXWÎNIN Û BIDIN XWENDIN.**



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 210 16.05.19 05:40

# GOTINÊN QIRDIKÊ SERSALÊ

Serê salê binê salê Xwedê
kurekî bidê kebaniya malê.

Kebaniyê destzêrînê destê xwe biavêje kulînê para qirdik jê helînê.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 211 16.05.19 05:40

# BÛKA BARANÊ

Dema baran nebare, zarok bûka baranê çêdikin, wê li nav gund digerînin û dibêjin:



-Bûka me baran divê, erdê me giya divê, dilê me xweşî divê û me ji Yezdan baran divê.
Gundî jî radibin avê bi ser zarokan dadikin.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 212 16.05.19 05:40

# ZÛGOTING

• Heft teşt mast, her heft teşt mast heta dev tije mast.

• Rovî li rê fitilî, rê li rovî fitilî.

• Kerê boz li rizdê zirî.

• Mamê min î Çeto ji wê ve hat. Tacek li serê wî ye. Tacê ji nav tacan tu çi tov tac î!

• Çil çûk û çil maçûk û çil çêlî li vî aliyê avê û çil çûk û çil maçûk û çil çêlî li wî aliyê avê. Her çil çûk û çil maçûk û çil çêliyên li vî aliyê avê bang kirin her çil çûk û çil maçûk û çil çêliyên li wî aliyê avê û gotin:
Hûn çend çûk û çend maçûk û çend çêlî li wî aliyê avê ne?
Vegerandin, gotin:
Em çil çûk û çil maçûk û çil çêlî li vî aliyê avê ne.

• Mast dibe çeqilmast,
çeqilmast nabe mast, mast tîrtir e ji çeqil-mast.

• Mamê Mişo sê sêşeman sê mişar sîr çand.


fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 213 16.05.19 05:40

• Çûme aşê Birc, hatine min heyşt hirç. Her heyşt hirç pişt bi pirç.

• Çûme mala Remo Ripinî. Min got: Ka weqîk ji rûnê mala Remo Ripinî. Weqîk ji rûnê mala Remo Ripinî li ser vî zerelepî sekinî.

• Çûme mera mala mele Remezan. Min got: Ka mera mala mele Remezan? Got: Mera mala mele Remezan çûye merdanê.

• Kurm qurm qul kir.



HER ZÛGOTINKÊ SÊ CARAN LI SER HEV BI DENG BIBÊJIN, GER WE ÇEWTÎ NEKIR, ZIMANÊ WE BI SER KURDÎ VEBÛYE.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 214 16.05.19 05:40

# METELOK / PÊKENOK

1- Qesra spî, bê derî.

2- Sibeh û êvarî ji hevalê xwe mezintir e, nîvro jê biçûktir e.

3- Şikefta yek derî, tê de hene sih û du kevirên spî.

4- Her roj diçe xwendegehê, lê tiştekî hîn nabe.

5- Li ser destan dişemite, dikeve çavan dişewite.

6- Hebanoka bi derzî, mar ji ber dibezî.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 215 16.05.19 05:40

Bersivên metelokan.


3


6


2


5


1


4



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 216 16.05.19 05:40



# 19. ÇANDA KURDAN

## SIRÛDA NETEWÎ
## CEJN, BAWERÎ, ÇÎROK

**BIXWÎNIN Û BIDIN XWENDIN.**



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 217 16.05.19 05:40

# EY REQÎB

Ey reqîb her, maye qewmê Kurd ziman
Naşikê û danayê topê zeman
Naşike û danayê topê zeman

Kes nebên Kurd dimirin
Kes nebên Kurd dimirin
Kurd jîn dibin.
Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan
Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan

Em xortên rengê sor û şoreş in
Seyr bike xwîna me ya me da rijan
Seyr bike xwîna me ya me da rijan

Kes nebên Kurd dimirin
Kes nebên Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan
Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 218 16.05.19 05:40

Em xortên Medya û Keyhusrew in
Dînîman û ayînman her niştiman
Dîniman û ayînman Kurd û Kurdistan
Kes nebên Kurd dimirin
Kes nebên Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan
Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan

Lawê Kurd rabûye ser pê wek şêran
Ta bi xwîn nexşîn dike tacî jiyan
Ta bi xwîn nexşîn dike tacî jiyan

Kes nebên Kurd dimirin
Kes nebên Kurd dimirin
Kurd jîn dibin
Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan
Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan

Lawên Kurd tev hazir û amade ne
Canfeda ne canfeda, tev canfeda
Canfeda ne canfeda tev canfeda

Kes nebên Kurd dimirin
Kes nebên Kurd dimirin
Kurd jîn dibin.
Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan
Jîn dibin qet nakeve ala Kurdan

*Dildar*

# NEWROZÊ

TU CEJNA GELÊ ARÎ NEWROZÊ NEWROZÊ
EM KARKERÊ VÎ KARÎ NEWROZÊ CEJNA ME
EMÊ HILDIN VÎ BARÎ NEWROZÊ NEWROZÊ
WERIN GEŞ KIN VÎ ARÎ NEWROZÊ CEJNA ME

NEWROZÊ NEWROZÊ NEWROZÊ CEJNA ME
NEWROZÊ NEWROZÊ NEWROZÊ CEJNA ME

BÎNA TE GELEK XWEŞ E NEWROZÊ NEWROZÊ
POR SORÊ ÇAVÊ REŞ E NEWROZÊ CEJNA ME
BI ÇIYA VE HILDIKIŞE NEWROZÊ NEWROZÊ
GOVENDA TE ŞOREŞ E NEWROZÊ CEJNA ME
NEWROZA GELÊ BINDEST NEWROZÊ NEWROZÊ
TE JIYANEK NÛ DIXWEST NEWROZÊ CEJNA ME
EZÊ BIPÊÇIM ÇEK Û REXT NEWROZÊ NEWROZÊ
TA TE BIBÎNIM SER TEXT NEWROZÊ CEJNA ME

NEWROZÊ NEWROZÊ NEWROZÊ CEJNA ME
NEWROZÊ NEWROZÊ NEWROZÊ PÎROZ BE



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 220 16.05.19 05:40

# NEWROZ

Dîsâ hâtî bihârê
Çâvê'm yarê digere
Ji ber ku îro Newroz e
Govenda me bo doz e

Newroz e Newroz e
Newroz e hevalê
Newroz e Newroz e
Newroz e delalê

Newroz hatî bixêr bê
Kêf û sebra'm pê tê
Destê yara xwe bigirim lê
Bigirim herim dawetê

Newroz e Newroz e,
Newroz e hevalê
Newroz e Newroz e
Newroz e delalê

Agirê Newroz gur bikin
Doza xwe xurt bikin
Azadiya me nêz bûye lê
Destê xwe hine bikin

Newroz e Newroz e
Newroz e hevalê
Newroz e Newroz e
Newroz e delalê



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 221 16.05.19 05:40

# Pîrozkirina cejna Newrozê ya li Akrê.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 222 16.05.19 05:40

Teyrê Tawûs, li gor ola êzdatî teyrekî pîroz e.



# Şahbanûya maran Şahmaran





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 224 16.05.19 05:40

# ŞAHMARAN

Ziriyal zanyarekî Kurd e, pirtûkeke bi navê "Xwezaya Cîhanê" dinivîse. Di vê pirtûka xwe de qala hebûna bajarekî di bin erdê de, yê maran dike. Ew di pirtûka xwe de wiha dibêje:

"Marên ji ber zilm û zordariya mirovan reviyane, li vî bajarî xwe vedişêrin."

Ziriyal wekî din di pirtûka xwe de dinivîse ku mafê ti zindiyê tine ye, li ser zindiyeke din zilm û zordariyê bike û divê mirov ji hemû zindiyan re rêz bigire.

Gava Ziriyal diçe ser dilovaniya xwe, ew pirtûk wekî mîrate ji kurê wî Camîsab re dimîne. Camîsab pirtûkê dixwîne û xeyal dike, rojekê wî bajarî bibîne û bi şahbanûya maran a pir xweşik re bijî.

Lê ji ber Camîsab û diya wî ya pîr di nava xizaniyê de ne, ew divê her roj here daristanê, êzingan berhev bike, bîne, li bajêr bifiroşe û bi pereyê bidest bixe, xwarina rojê peyde bike.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 225 16.05.19 05:40

Rojekê di çûna daristanê a di berhevkirina êzingan de, li bîreke ji hingiv dagirtî rast tê. Ji bo karibe hingiv tevî derxe, pêwîstiyê bi alîkariya kesekî din dibîne û ji hevalekî xwe alîkariyê dixwaze. Hevalê wî pê re tê, hingivî tev derdixin, di satila dawî de, hevalê wî, Camîsabî di binê bîrê de dihêle û diçe.

Ji ber bîr kûr e, Camîsab nikare derkeve, dema derdor tarî dibe, dibîne ji quleke di dîwarê bîrê de ronayiyek xwe vedidize hundir. Bi kêra di dest de qulê firehtir dike û tê re derbas dibe. Ew derdikeve bexçeyekî her cureyê şînayî, fêkî û xweşiyê lê heye. Di wê kêliyê de bi hezaran mar li derdora wî peyde dibin û mar wî dibin ba şahbanûya maran Şahmaranê.

Şahmaran ewqasî bi xeml û xweşik e, Camîsab li ber digere da li wir bimîne. Şahbanû dibêje:

- Bavê te mirovekî zanyar û dostê hemû zindiyan bû. Di nava mirovan de qet zirara wî negihiştibû me maran. Ji bo wê tu mêvanê me yî û heta dilê te bixwaze, tu dikarî li vir bimînî.

Piştî demekê Camîsab doza zewacê li



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 226 16.05.19 05:40

Şahmaranê dike. Wezîrên Şahmaranê destpêkê vê daxwazê napejirînin, lê li ser israra Camîsab û Şahmaranê, bi şert dipejirînin. Ew piştî sê rojan vedigerin, sê pirsan didin ber Camîsab û bersivên wan ji Camîsabî dixwazin.

**Pirsa yekê: Jiyan çi ye û mirin çi ye?**

Camîsab bersiva vê pirsê wiha dide:
- Jiyan tiştekî wiha ye, ti zindî heta îro haydarê sira wê nebûye, lê belê divê her zindî, bê kêmasî xwediyê mafê jiyanê be. Divê di nava zindiyan de azadî, wekhevî û aştî hebe û divê her zindî ji vê yekê sûd bigire.

Li ser mirinê jî dibêjim, divê her zindî zanibe wê rojekê bimire. Mirin jî sirekî wiha ye, heta îro ti zindî lê haydar nebûye. Ez dibêjim, mirin û jiyan destbirakên hev in.

**Pirsa duyê: Ya ku cîhanê bi hêza xwe digerîne çi ye?**

Camîsab bersiva vê pirsê jî wiha dide:
- Baweriya min ew e, tiştê cîhanê li ser hêza xwe digerîne, evîna li nav dilê jiyanê bi xwe ye. Jiyan bê evîn, evîn jî bê jiyan nabe.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 227 16.05.19 05:40

**Pirsa Sêyê: Ger ev kurê mirovan bi şahbanûya me re bizewice divê heta dawiya imrê xwe li vir bimîne. Gelo wê Camîsab karibe li ber hesreta welêt a mezin diyax bike û dernekeve ser ruyê erdê?**

Bersiva Camîsab ji vê pirsê re jî dibêje:
- Erê, ezê heta dawiya imrê xwe bimînim.

Li ser vê zanistî û sozdayînê, desteya wezîran zewaca wan dipejirînin. Piştî çend salek derbas dibe, rojekê Camîsab li ber Şahmaranê digere û dibêje:

- Min bêriya dayika xwe û gundê xwe kiriye û dixwazim herim serdana wan.

Şahmaran dibêje:

- Hûn mirov qet li ser soza xwe ranawestin, bawerî bi we nayê. Ger tu bikevî zorî û zehmetiyê tê ciyê me ji mirovên din re bibêjî û wê ew jî werin vê şaristaniya me tar û mar bikin.
Lê belê Camîsab di daxwaza xwe de israr dike. Li ser vê yekê Şahmaran destûrê dide wî û ew diçe ser ruyê erdê, vedigere jiyana xwe ya berê.



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 228 16.05.19 05:40

Li wî welatî, piştî demekê şahê welêt nesax dikeve. Hekîm kom dibin û dermanekî nabînin, derveyî Şahmaranê. Hekîm dibêjin:

- Ger xwîna Şahmaranê vexwe ewê ji nexweşiyê xelas bibe.

**Lê kî ciyê Şahmaranê dizane?**

Kesên zanyar dibêjin:

Bila her kes were himamê serê xwe bişo, laşê kê pûl bi pûl be, wî welatê maran û Şahmaran dîtiye. Ew dikare ciyê wê şanî me bide. Şahê welêt fermanê dide û herkes bi dorê tê himamê serê xwe dişo. Leşkerên wî jî dinêrin, bê laşê kê pûl bi pûl e.

Herî dawî Camîsab jî mecbûr dimîne, diçe himamê. Ji ber ku bi maran û Şahmaranê re jiyaye, laşê wî tev pûl bi pûl e.

Leşkerên şah îşkenceyê lê dikin û cihê Şahmaranê jê hîn dibin. Tev tên ser bîra hingiv û Şahmaranê digrin, dibin hizûra şahê welêt. Berî serjê bikin, Şahmaran vedigere ser Camîsab û dibêje:



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 229 16.05.19 05:40

- Divîbû min qet baweriya xwe bi we kurêmirovan neanîba. Lê tiştê qewimiye êdî venagere. Ez dizanim hûnê serê min jêkin, qe ne daxwaza min a dawî bi cih bînin. Ji xwîna min tasa yekê bidin şah, ya duyê bila wezîr vexwe û ya sêyê jî bila ji Camîsab re be.

Bi vexwarina tasa yekê, padîşah di cih de dimire, bi tasa duyê wezîr jîr û zana dibe, bi vexwarina tasa sêyê laşê
Camîsab dibe wek laşê mirovan qet pûl li ser namînin.

Lê belê çîrok li vir bi dawî nabe...

Wezîrê li ciyê şah dibe şahê nû yê welêt, Camîsab li ba xwe dike wezîr û destûrê dide wî, da laşê Şahmaranê daxînin welatê maran ên li binê erdê û devê bîra hingiv bigrin, ji bo mirov zirarê nedin wan û ew jî dernekevin ser ruyê erdê.

**Piştî mirina Şahmaranê bi sê rojan ji laşê wê keça wê di çardehsaliya xwe de tê dinyê û mar dîsa digihêjin şahbanûya xwe û jiyana xwe ji mirovan dûr di nava aştî û aramiyê de didomînin...**



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 230 16.05.19 05:40

# PÊVEK

Pêveka 1ê : Lîstika nasîna alavên xwendegehê.
girêdayî rûpela 65ê

Pêveka 2yê : Lîstika hînbûna navê ajalan.
girêdayî rûpela 79ê

Pêveka 3yê :

a) Lîstika hînbûna navê şînayiyan. girêdayî rûpela 101ê

b) Lîstika hînbûna navê fêkiyan. girêdayî rûpela 102yê

Pêveka 4ê : Strana nasîna rengan.
girêdayî rûpela 103yê

**Lîstikên li jêr jêbikin û devkî deynin ser maseyê. Piştre bi dorê du liban vekin. Ger ji hev bin ji xwe re bibin, ger ne ji hev bin dora hevalê we ye.**
**Dawî bijmêrin, bê kê çend cot bidest xistiye.**
**Li ba kê zêdetir cot hebin, ew bi ser dikeve.**



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 231 16.05.19 05:40

Pêveka 1ê : Lîstika nasîna alavên xwendegehê.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 232 16.05.19 05:40


























fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 233 16.05.19 05:40

Pêveka 2yê : Lîstika hînbûna navê ajalan.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 234 16.05.19 05:40





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 235 16.05.19 05:40

Pêveka 3yê : Lîstika hînbûna navê şînayiyan.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 236 16.05.19 05:41

Pêveka 3yê : Lîstika hînbûna navê fêkiyan.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 237 16.05.19 05:41

Pêveka 4ê : Strana nasîna rengan.

| | |
|---|---|
| **Sor im rengê gulê.** |  |
| **Kesk im rengê kevzê.** |  |
| **Zer im rengê rojê.** |  |
| Spî me rengê berfê. Spî me rengê berfê. |  |
| **Reş im rengê şevê.** |  |
| **Şîn im rengê ezmên.** |  |



fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 238 16.05.19 05:41

Gewr im
rengê xweliyê.



Qehweyî rengê erdê.
Qehweyî rengê erdê.



Binevşî rengê kulîlkan.
Binevşî rengê kulîlkan.



Pembeyî rengê hinarikan.
Pembeyî rengê hinarikan.



Şîrikî rengê perperîkan.
Şîrikî rengê perperîkan.



Pitkpitkî rengê xalxalokan.
Pitkpitkî rengê xalxalokan.





fêrbûna kurdî pêngava yekê.indd 239 16.05.19 05:41

*Zimanê mirov nasnameya mirov e. Ji ber di jiyana rojane de mirov bi kîjan zimanî bide û bistîne, ew ji mirov re dibe nasname.*

*Çawa ku her dar li ser koka xwe şîn tê, her mirov jî bi zimanê xwe mezin dibe.*

*Kurdî ji kûrayiya dîrokê tê. Mirovên li navbera Dîjle û Firatê bi cî bûn û şaristanî ava kirin, bi Kurdî dipeyivîn.*

*Xwedîderketina li Kurdî xwedîderketina li vê dîrokê ye û bikaranîna Kurdî xwegihandina dewlemendî û xweşiya vê çanda dergûşa mirovahiyê ye.*